

# Buro bi daxwaza Tirkiyeyê hatin girtin

**Bi biryara hikûmeta başûrê Kurdistanê buroyên Tevgera Azadî hatin girtin. Tevgera Azadî diyar kir ku buroyên wan bi daxwaza dewleta tirk hatin girtin**

**DI 25'Ê MIJDARÊ DE** Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê bi daxuyaniyekê diyar kir ku dê partî û rêxistinên ku fermiyeta wan nîne, bigirin. Piştî vê biryarê 4 buroyên Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê hatin girtin. Li ser girtina buroyan sefîrê tirk yê li başûrê Kurdistanê Hakan Karaçay spasiya hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê kir. Di serî de gelê Başûr û gelek partî û rêxistinên kurdan ev biryara YNK'ê û hikûmeta Başûr şermezar kir.

**TEVGERA** Azadî têkildarî mijarê daxuyanî da û da zanîn ku buroyên wan bi daxwaza dewleta tirk hatiye girtin û wiha hat gotin: "Me gotibû, li ser helwesta kê em hatine qedexekirin. Ne li ser mijara qanûnî ye. Êdî Tirkiye dixwaze li Herêma Kurdistanê bibe walî û bi rê ve bibe. Divê hemû kesên xwedî helwest vê qebûl nekin. Em ê vê mijarê bikin rojeva xwe û em ê li hemberî wê bêdeng nemînin. Em ê hemû rêyên qanûnî bi kar bînin."... *R.3*

**Tevgera Azadî konferans li dar xist...** *R.3*

@rojname

2 Kanûn - Yekşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 192

# Pêl bi pêl mezin dibe

## Ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan, parlamenter Leyla Guven dest bi greva birçîbûnê kir. Ji bo piştgiriyê, piştî girtiyên PKK û PAJK'î, Sebahat Tuncel û 14 jin jî ketin greva birçîbûnê


### KET ROJA 25'EMÎN

Hevseroka KCD'ê û parlamenter Leyla Guven di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 25 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Her wiha li gelek girtîgehan girtiyên siyasî jî di grevê de ne. Li Hewlêrê greva birçîbûnê dewam dike û dê li 6 bajarên din jî welatî û HDP'î bikevin grevê. Hevseroka DBP'ê Sebahat Tuncel û 14 jin ji bo piştgiriyê bidin çalakiya Guven ketin grevê.



### DAXWAZA HEMÛ JINAN E

Bi pêşengiya hevkarên Tevgera Jinên Azad (TJA) û Meclisa Jinan a HDP'ê bi dirûşma; 'Rêxistinbûyîna me azadiya me ye' Konferansa Jinan hat lidarxistin. Di konferansê de peyama Leyla Guven hat xwendin. Guven diyar kir ku heta bersiv nedin daxwazên wê, dê çalakiya xwe ya greva birçîbûnê ya bêdem berdewam bike. Hevberdevka Meclisa Jinan a HDP'ê Dîlan Dîrayet Taşdemîr jî got ku daxwaza Guven daxwaza wan hemûyan e... *R.2/3*




### Tecrîdî sînorê Îmraliyî vîyartî

Hemsereka ÎHDyî Eren Keskîne bale ante tecrîdo ke Îmraliyî de bi hawayêkê sîstematkîkî 19 serrî yê dewam keno û grevê vêşanîye seba wedartişê tecrîdî destpêkerdene û ard ziwan ke tecrîdî sînorê Îmraliyî vîyartî...

RÛPEL - 5

# Sûr bû Keleha Dimdimê

Li navçeya Sûrê ya Amedê di 2'yê Kanûna 2015'an de qedexeya derketina derve hatibû îlankirin û ev qedexe 103 rojan dewam kir. Parlamentera HDP'ê Remziye Tosûn jî bû şahida serdema qedexeyê û ew jî 96 roj şûnde ji Sûrê hatibû tehliyekirin. Remziye Tosûn serhildana li Sûrê şiband Keleha Dimdimê.




### Li dijî zilmê serî hildan

Parlamenter Remziye Tosûn da zanîn ku kesên 'hendek kolandin' ciwanên Sûrê bûne û diyar kir ku Sûr qêrîna ciwanan a li dijî neheqiyan bû û wiha pê de çû: "Komkujî, zilm, zext û êrîşên li ser gelê kurd bûbû sedema serhildana ciwanên Sûrê. Ciwanan gelê Sûrê parast."... *RÛPEL - 3*




## Dayikan aqûbeta Elçî û Epozdemîr pirsîn


Dayikên Şemiye ji bo aqûbeta windayan bipirsin û kujerên xizmên wan bên darizandin, di hefteya 714'an de çalakiya xwe pêk anî. Dayikên Şemiyê ku dixwestin li Qada Galatasarayê kom bibin û daxuyaniyê bidin çapemeniyê, dîsa rastî astengiya polîsan hatin. Dayikan di çalakiya vê hefteyê de aqûbeta serokê Baroya Amedê Tahîr Elçî û parêzer Şevket Epozdemîr pirsîn. Her wiha Xizmên Windayan û şaxên ÎHD'ê yên Amed û Êlihê jî vê hefteyê aqûbeta windayan pirsîn... *RÛPEL - 3*



### Ya girîng tifaqa jinan e

Endama Lijneya Rêveveber a MYK'a HDP'ê Îlknur Bîrol têkildarî hilbijarinên herêmî axivî û anî ziman ku rojeva sereke ya hilbijartinên herêmî tifaqa jinê ye û dixwazin şaredariyên ku hatine xespkirin rizgar bikin...

RÛPEL - 2



### Li Çelê dagirkeriya leşker û polîsan

Hilbijartinên rêveberiyên herêmî her ku diçe nêz dibin. hevşaredarê Çelê yê ku li şûna wî qeyûm hatiye tayînkirin, Servet Tûnç destnîşan kir ku dengê leşker û polîsên li Çelê ji yên gel zêdetirin...

RÛPEL - 3

### Ji bo medreseyê malzemeyên sexte

*LI NAVÇ EYA* Cizîra Şirnexê, Medreseya Sor a dîrokî ya tirba tesawûf û şaîrê kurd ê bi nav û deng Melayê Cizîrî jî li wir e, hildiweşe. Hemû malzemeyên di dema restorekirina medreseyê de hatin bikaranîn, ji ber ku ne baş bûn, niha hemû hildiweşin... *RÛPEL - 6*

## Rêyên qeyûman dibin avê de man



Ji ber barana zêde li navend û navçeyên Şirnex û Mêrdînê, bandorê li ser jiyana welatiyan kir. Li navend û navçeyên herdu bajaran, ji ber barana zêde rêyên qeyûman ku propagandaya wan dikirin dibin avê de man. Her wiha li Amedê jî gelek kolan û rê di bin avê de man... *RÛPEL - 3*

www.arsivakurdi.org




## Di doza îstîsmara zayendî ya li Pasûrê de hinceteke sosret

**AMED -** Li Pasûra Amedê zaroka 14 salî ya bi navê F.B ku astengdara zihnî ye, di navbera 13'ê hezîrana 2014 û 21'ê adara 2015'an de rastî îstîsmara zayendî ya sîstematîk a 94 mêrî hat. Li ser gilîkirina F.B doz hat vekirin û di dozê de heyeta dadgehê hemû gumanbar tahliye kirin û ji bo F.B jî rapora SaziyaTipa Edlî (STE) xwest. Tevî ku di ser biryarê de 10 meh derbas bûne, hat hînbûn ku bi hinceta pereyê emniyeta Mûşê tune ye F.B nebirine STE'ê û Saziya Stara Zarokan jî ji bo F.B ya ku ewlehiya canê wê tune ye, daxwaznameyek '18 saliya xwe tije kiriye, bila tedbîra parastinê û stara wê bê rakirin' şandiye.



# Guven: Heta encamê dê çalakiya min bidome

Li Amedê bi pêşengiya TJA'yê Konferansa Jinan pêk hat. Di konferansê de peyama Leyla Guven hat xwedin. Guven got ku heta bersiv ji daxwazên wê re neyê dayîn dê çalakiya xwe bidomîne. Her wiha hevseroka DBP'ê Sebahat Tuncel ku li Girtîgeha Tîpa F ya Kandirayê dimîne û 14 girtiyên din jî dest bi greva 10 rojan kir

Bi pêşengiya hevkarên Tevgera Jinên Azad (TJA) û Meclisa Jinan a HDP'ê Konferansa Jinan a bi dirûşma 'Rêxistinbûyîna me azadiya me ye' li Salona Konferansê ya Vedat Aydin a avahiya HDP'ê ya Amedê pêk hat. Gelek aktîvîstên TJA û endamên Meclisa Jinan HDP'ê beşdarî konferasnê bûn. Jinan bi kincên xwe yên gelêrî berî ku konferans dest pê bike govend gerandin û dirûşmên 'Jin, jiyan, azadî', 'Bijî berxwedana zindanan' û 'Bê Serok jiyan nabe' berz kirin.

Piştî deqeyeke rêzgirtinê ji bo têkoşerên azadiyê, dîwan hat hilbijartin. Piştre jî peyama hevseroka KCD û parlamentera Colemêrgê Leyla Guven a ev 25 roj in li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê ketiye greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger hat xwendin. Peyama ku Guven şand wiha ye: "Ez konferansa we silav dikim. Ez hemû jinên ku li derve piştgiriyê didin min silav dikim. Ez silavên xwe bi taybetî ji Dayikên Aştiyê re dişînim. Ji bo protestokirina tecrîda li ser gelê kurd û birêz Ocalan min dest bi vê çalakiyê kir. Heta ez bersivê bistînim, ez ê çalakiya xwe bidomînim. Ez dizanim ev têkoşîneke rewa ye û em ê bi ser bikevin."

**'Em vê hişmendiyê nas dikin'**

Piştî xwedina peyama Guven, hevberdevka Meclisa Jinan a HDP'ê Dîlan Dîrayet Taşdemîr axaftina vekirina konferansê kir û ev tiştê anî ziman: "Polîtîkayên ji Rojhilat heta Başûr tên birêvebirin, polîtîkayên înkar û pişaftinê ne. Em baş dizanin ku desthilatdar ne tenê îro, bi sedsalan e van polîtîkayan bi rê ve dibin. Êdî gihaye wê astê ku navê jinan jî qedexe dikin. Em vê hişmdiyê di şexsê tecrîdê de, rêhevalên me yên dilgirtî û di komkujiya jinan de baş nas dikin. Di heman demê de em dikarin bêjin tu caran jinan li hemberî van êrişan serî netewand û dê tu carî teslîm nebin."

**Berxwedana li dijî tecrîdê girîng e**

Di berdewamê de Taşdemîr bal kişand ser çalakiya Guven û wiha pê de çû: "Daxwazên Guven daxwazên me hemûyan in û em hemû li dijî tecrîdê ne. Îro Guven bûye dengê me û em ê jî li her derê bibin dengê Guven. Em ê li dijî tecrîda li ser birêz Abdullah Ocalan, di heman demê tecrîda li ser gelê kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn e. Em weke jinên HDP'ê di bin tecrîdê de ne û tecrîda li ser xwe qebûl nakin. Ji ber vê divê em azadiya birêz Ocalan di rojevê de bigirin û li dijî tecrîdê têkoşîna xwe berfireh bikin." Her wiha Taşdemîr pêvajoya hilbijartina herêmî ya 31'ê adarê jî nirxand û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev hilbijartin ji bo me roja hesappirsînê ye. Em ê di vê hilbijartinê de bersivek xurt bidin wan. Di vê pêvajoyê de pewîra herî mezin dikeve li ser milê me jinan. Em ê di vê pêvajoyê de têkoşîna xwe mezintir bikin û encamên xurt bi dest bixin." *AMED*



# Rojeva sereke ya hilbijartinê tifaqa jinan e




Endama Lijneya Rêveveber ya MYK'a HDP'ê Îlknur Bîrol di der barê hilbijartinên herêmî de girîngiya tifaqa jinê nirxandin kir.

Bîrol diyar kir ku wek Meclisên Jinan yên HDP'ê ji bo avakirina demokrasiya herêmî, ji bo tifaq li bajarên Tirkiyeyê bên kirin û şaredariyên bi qeyûman hatine xepskirin bên girtin, xebatan dimeşînin û wiha got: "Me gelek tişt li tecrubeyên xwe yên berê zêde kirine. Di heman demê de plansaziyên kêm mabûn em ê ji nû ve bikin jiyanê. Em bi xebatên ku jinan xurt dike, dijminahiya li hember jinan beralî dike diçin hilbijartinan. Em ê ji hilbijartina keya û şaredariyan demokrasiya herêmî biafirînin. Em Meclisa Jinan ji bo namzetên jin bên xurtkirin bi bernameyên taybet dixebitin. Em ê tu caran dev ji nûneriya wekhev bernedin."

Bîrol bal kişand ser tifaqa jinan û got ku li dijî êrişên li hemberî jinan ew tifaqa jinê diparêzin. Bîrol anî ziman ku tifaqa jinan ji tifaqên siyasî yên din cudatir e û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo hilweşandina zîhniyeta mêr a li her derê, tifaqa jinê gelek girîng e. Em ê di hilbijartinên herêmî de jî bi vê tifaqê bibin civakî." *ENQERE*

## Tuncel û 14 girtiyên jin dest bi greva birçîbûnê kir



Çalakiya hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Leyla Guven bi daxwaza rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di 7'ê mijdarê de li Girtîgeh Tîpa E ya Amedê dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kir. Piştgiriya bi çalakiya Guven re jî pêl bi pêl mezin dibe.

Di 27'ê mijdarê de jî girtiyên PKK'ê û PAJK'ê da zanîn ku bi dirûşma 'Bila tecrîda li Îmraliyê rabe' dê li hemû girtîgehan kom bi kom ji bo 10 rojan dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya dorveger û bêdem bikin. Bi heman armancê, hevseroka giştî ya DBP'ê Sebahat Tuncel ku li Girtîgeha Tîpa F ya Jimar 1 a Kandira ya Kocaeliyê dimîne û 14 girtiyên din, dest bi greva birçîbûnê ya 10 rojan kir.

Tuncel têkildarî mijarê li ser navê girtiyan peyamek şand û di peyamê de wiha got: "Daxwaza Leyla Guven ne tenê daxwaza wê ye. Daxwaza Leylayê, daxwaza milyonan gelê kurd û dostên gelê kurd e. Ji ber vê yekê ji bo têkoşîna aştî, demokrasî û azadiyê ya gelê welatê me, azadiya birêz Ocalan teqez divê pêk bê û rastiyek dîrokî ye. Ji bo vê yekê jî divê bi lez tecrîda li ser birêz Ocalan bi dawî bikin û şertên ewlehî, tenduristî û azadiyê teqez pêk bînin. Bi vê ferasetê li Girtîgeha Kandirayê em 15 hevalên jin ji bo 10 rojan dest bi çalakiya bêdem û bi dorveger dikin. Em bang li hemû gelê kurd û hêzên demokratîk dikin ku vê têkoşînê bilind bikin." *KOCAELÎ*

## 'Dixwazin bi gef û zextan ciwanên apolîtîk biafirînin'

Ji Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst (SGDF) Hîvda Selen, Erturk Yilmaz û ji Hêza Şoreşger Ejder Ok, di hefteyên borî de li Îzmîrê ji aliyê polîsan ve rastî ferzkirina sîxuriyê hatin.

Xwendekara Zanîngeha Egeyê Hîvda Selen diyar kir ku 3 hefte berê ji aliyê polîsê ku gotiye navê wî 'Umut' e rêya wê hatiye birîn û wiha got: "Ji min re got 'ez ê te di alî aborî de xurt bikim, ez ê di perwerdeya te de bibim alîkar'. Ji bo vê jî daxwaz kir ku ez beriya çalakî û belavkirina belavokan agahî bidim. Lê min red kir. Rojek din dîsa hewl da min bikişîne aliyekê lê ez neçûm. Piştre bi telefonê li min geriya lê min telefon li rûyê wî girt."

Selen daxuyand ku sala borî ji malbata wê û bi heman awayî malbatên hevalên wê jî rastî gefa 'em ê li malê komkujiyê bikin' hatine.

Her wiha Selen da zanîn ku armanca van gefan ew e ku ciwana ji qada siyasî bikişînin û apolîtîk bikin û wiha bi dawî kir: "Lê tu zext nikarin me şûnde bikişînin. Baweriya min a bi têkoşînê zêdetir bû." *ÎZMÎR*

## Zarokên Girkê Legê fêrî taykwandoyê dibin



Taykwando yek ji şêwazên parastinê yên Koreyê ye. Mîna kareteyê ye lê di taykwandoyê de bi piranî ling tên bikaranîn. Taykwando beriya 2 hezar salan li Koreyê derketiye. Li navçeya Girkê Legê ya girêdayî kantona Qamişloyê jî 92 zarok ji hemû temenan, li ser taykwandoyê ku di demên niha de pir girîng e, xwe perwerde dikin. Perwerde bi awayekî rojane tê dîtin. Perwerde ji aliyê pisporên ku kemer di vê sporê de wergirtine ve tê dayîn.

Di vê çarçoveyê de jina ku perwerdeyê dide û kemera reş wek lîstikvaneke navneteweyî di sala 2016'an de wergirtiye, diyar kir ku gelek kes berê xwe didin wan da ku fêrî vê sporê bibin, ji ber ku ev spor laş xurt dike û di heman demê de mirovan fêrî xweparastinê dike.

Delal Îsa keça ku perwerdeyê dibîne û gihîştiye asta kemera reş got ku ji ber sûdên psîkolojîk xwestiye fêrî vê sporê bibe.

Jina ku perwerdeyê dide Meyasa Mûrad jî anî ziman ku bi taybetî jinên herêmê gelek kes berê xwe didin wan da ku fêrî vê sporê bibin û her wiha destnîşan kir ku ew hewl didin tev li pêşbirkên navneteweyî bibin. *QAMIŞLO*

www.arsivakurd.org

# Ji girtinê dagirker sûd werdigirin

Hevserokatiya Tevgera Azadî li ser gotina sefîrê tirk Hakan Karaçay a ku tevgerê wek 'terorîst' bi nav kir, daxuyaniyeke nivîskî da. Tevgera Azadî diyar kir ku ji biryarê tenê dagirkerên Kurdistanê sûd wergirtin



Hikûmet Herêma Kurdistanê di 25'ê mijdarê de bi daxuyaniyekê diyar kir ku dê partî û rêxistinên ku fermiyeta wan nîne, bigirin. Piştî vê biryarê hêzên asayîşê yên girêdayî YNK'ê, 4 buroyên Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê girtin. Piştî girtina buroyên Tevgera Azadî, sefîrê tirk ê li Herêma Kurdistanê Hakan Karaçay spasiya hikûmeta Herêma Kurdistanê kir û di heman demê de Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê weke 'terorîst' bi nav kir. Têkildarî mijarê hevserokatiya Tevgera Azadî daxuyaniyek da.

Tevgerê diyar kir ku daxuyaniya nûnerê dewleta tirk a li nava xaka Herêma Kurdistanê, ji derveyêi binpêkirina serwerî û rûmeta Herêma Kurdistanê û Iraqê, derbaskirina hemû sînorên îdarî, siyasî û şikandina hemû pîvanan e û wiha got: "Bi taybetî Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê destûra fermî heye û xebateke siyasî li ser bingeha demokrasî û aştiyê dike. Xwedî helwesteke neteweyî ye û tu hêz û aliyek nikare weke 'terorîst' bi nav bike. Her wiha tu kes nikare bi sûcekî tewanbar bike."

Di daxuyaniyê de Tevgerê destnîşan kir ku ji destpêka damezirandinê heta niha ew serlêdanan ji bo fermiyetê dikin lê hîn jî bersiv ji wan re nehatiye dayîn û wiha domand: "Hinek caran biryarên ji aliyê Herêma Kurdistanê ve tên derxistin, dikevin berjewendiyên dagirkerên Kurdistanê. Tevî vê jî ji aliyê Iraqê ve weke hemû partiyên Iraqê û Herêma Kurdistanê fermiyeta heye. Mafê me heye ku li her 19 parêzgehên Iraqê baregehên xwe vekin û karê xwe yê siyasî bikin."

Tevgerê gotina nûnerê Tirkiyeyê yê li Herêma Kurdistanê Hakan Karaçay ku partiya wan wek 'terorîst' bin av kir bi bîr xist û da zanîn ku ji biryarê tenê dagirkerên Kurdistanê sûd werdigirin û wiha pêde çû: "Êdî Tirkiye dixwaze li Herêma Kurdistanê bibe walî û bi rê ve bibe. Divê hemû kesên xwedî helwest vê qebûl nekin. Divê komên partiyan ên li Parlamentoya Iraqê û Herêma Kurdistanê li hemberî vê xwedî helwest bin. Divê hikûmeta Iraqê jî bêdeng nemîne. Bêdengbûn helwesteke teslîmbûyî ye. Hinek hêz û alî jî alîkariya Tirkiyeyê dikin. Em ê vê mijarê bikin rojeva xwe û em ê li hemberî vê yekê bêdeng nemînin. Emê hemû rêyên qanûnî bi kar bînin." *HEWLÊR*

# 'Rêya Elçî û Epozdemîr rêya me ye'

Dayikên Şemiyê ji bo aqûbeta windayan bipirsin û kujerên xizmên wan bên darizandin, di hefteya 714'an de çalakiya xwe pêk anî. Dayikên Şemiyê ku dixwestin li Qada Galatasarayê kom bibin û daxuyaniyê bidin çapemeniyê, dîsa rastî astengiyan polîsan hatin. Tevî dorpêç û hemû astengiyan jî dîsa Dayikên Şemiyê û Mirovên Şemiyê li avahiya ÎHD'ê kom bûn û daxuyanî da.

Dayikan di çalakiya vê hefteyê de aqûbeta serokê Baroya Amedê Tahîr Elçî û parêzer Şevket Epozdemîr pirsîn. Dayikan got Elçî û Epozdemîr ji bo edaletê têkoşiyan e û diyar kir ku rêya Elçî û Epozdemîr rêya wan e.

Her wiha Xizmên Windayan û şaxên ÎHD'ê yên Amed û Êlihê jî vê hefteyê aqûbeta windayan pirsîn û xwestin ku kujerên wan bên dîtin. Di çalakiyan de hat destnîşankirin ku dewlet dixwaze kesên hatin windakirin bidin jibîrkirin lê heta ku aqûbeta hemû windayan tê zanîn û kujer tên darizandin dê têkoşîna wan bidome. Xizmên Windayan aqûbeta Tahir Elçî jî ji dewletê pirsîn. *AMED - STENBOL*



## Dengê leşker û polîsên li Çelê ji yên gel zêdetirin



Ji hilbijartinên rêveberiyên herêmî re çar meh man. Beriya hilbijartinên herêmî ku dê di 31'ê adara 2019'an de bê lidarxisin, hikûmeta AKP'ê ji bo bidestxistina şaredariyên bakurê Kurdistanê ketiye nava liv û tevgerên cuda. Yek ji van şaredariyên ku hikûmeta faşîst a AKP-MHP'ê dixwaze bi dest bixe jî Şaredariya Çelê ya Colemêrgê ye. Têkildarî rewşa dawî ya hevşaredarê Çelê yê ku li şûna wî qeyûm hatiye tayînkirin, Servet Tûnç axivî.

Servet Tûnç diyar kir ku li Çelê hejmara leşker û polîsan hejmara hilbijêrên li navçeyê derbas kiriye û anî ziman ku piştî qeyûm hat tayînkirin şaredarî veguherî qereqolekê û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Qeyûm 3 milyon lîreyên di qaseya şaredariyê de xerc kir. Niha jî şaredarî bi qasî 6 milyon lîreyan deyndar kiriye. Leşkerên li qereqol û qaleqolên li Çelê, li navenda navçeyê hatine qeydkirin. Ji ber vê nîvê hejmara hilbijêran ên derve ne. Gelek leşkerên li binkeyên leşkerî yên tu eleqeya wan bi navenda Çelê re nîne jî li ser navçeyê hatine qeydkirin. Niha hema bêje hejmara dengên gel û hejmara dengên leşker û polîsan wekî hev e. Heta em dikarin bêjin a leşker û polîsan zêdetir e. Bi vî awayî dixwazin navçeyê biçewisînin. Em ê bibînin bê ev yek tbandoreke çawa li hilbijartina herêmî ya 31'ê adarê dike." *COLEMÊRG*

# Rêyên qeyûman di bin avê de man

Ji ber barana zêde li navend û navçeyên Şirnex û Mêrdînê, bandorê li ser jiyana welatiyan kir. Li navend û navçeyên her du bajaran, ji ber barana zêde rêyên qeyûman ku propagandaya wan dikirin di bin avê de man.

Li navçeyên Cizîr, Elkê, Silopî û navenda Şirnexê gelek xanî di bin avê de man. Dîsa rêyên qeyûman propagandaya wan dikirin di bin avê de man. Kortikên li ser rêyan vebûn, ajokar tengasî jiyan. Li tevahiya bajêr binesaziya gelek cihan tebiqîn û ji ber vê gelek kolan di bin avê de man.

Li Mêrdîn û navçeyên wê jî heman tablo hat jiyîn. Bi taybetî li navçeya Nisêbînê, kanalîzasoyana Îpekyolû xitîmî, kortik vebûn û piştî hewldanek direj rê li trafîkê hat vekirin. Ji ber barîna barana zêde hemû kolanên navenda bajêr dibin avê de man û kolanê nehatibûn asfaltkirin veguherîn gola heriyê û ji ber vê yekê welatiyan gelek zehmetiyan jiyan. *ŞIRNEX - MÊRDÎN*





## Sûr li dijî zilmê bû Keleha Dimdimê

Li navçeya Sûrê ya Amedê di 2'yê Kanûna 2015'an de qedexeya derketina derve hatibû îlankirin û ev qedexe 103 rojan dewam kir. Qedexeya li Sûrê wekî qedexeya herî dirêj a li cîhanê di rûpelên dîrokê de hat nivîsandin. Navçeya xwediyê dîroka bi hezar salan hem ji hewa hem jî ji bejayî ve hat bombebarankirin. Tevî hemû zordestiyan gelek sivîlên ku malên xwe terk nekirin jiyana xwe ji dest da. Gelek kes jî hatin girtin. Tevî ku li ser qedexeyê 3 sal jî derbas bûne cenazeyên ku nasnameyên wan nehatine tespîtkirin û li goristanên bêkasan hatine veşartin hene.

Gelek avahiyên Sûrê ji aliyê Wezareta Bajarvanî û Derdorê di bin navê 'Veguhertina bajêr' de hat hilweşandin. Hîn jî gelek kuçeyên wê bi stûnên betonî hatine dorpêçkirin û kes nikare derbasî wir bibe. Li serê her kuçeyê noqteyek polîsan hatiye avakirin. Tevî ku Sûrên Amedê û Baxçeyên Hevselê di bin parastina UNESCO'yê de ne jî li dijî hilweşandinê mudaxaleyek nehat kirin.

**'Sûr cîhana me bû'**

Parlamentera HDP'ê Remziye Tosûn jî bû şahida serdema qedexeyê û ew jî 96 roj şûnde ji Sûrê hatibû tahliyekirin. Tosûn di serdema ku hatibû tahliyekirin bi zaroka xwe ya 2 salî ya bi navê Bêrîtan re hatibû girtin. Tosûn piştî girtina 15 mehan ji girtîgehê derket û di hilbijartina 24'ê hezîranê de wek parlamentera HDP'ê ya Amedê hat hilbijartin.

Der barê qedexeyan de Tosûn axivî. Tosûn behsa Sûrê ya beriya qedexe û hilweşandinê kir û ev tişt anî ziman: "Sûr mala me bû. Kesên ku li wir dijiyan wekî malbatekê bûn. Cîrantiya wir xweş bû. Kuçeyên me her dem zindî bûn. Ez 22 salan li Sûrê jiyam. Heger Sûr hilneweşandana ez ê hîn li wir bûma. Aliyekî Sûrê yê ku aramî dida mirovan hebû. Ji dil bû."

**Şehîdê destpêkê**

Di axaftina xwe de Tosûn destnîşan kir ku piştî 7'ê hezîrana 2015'an şûnde destpêkê li taxa Lalebeyê ya Sûrê bûyer qewimîne û wiha domand: "Di navbera polîs û ciwanan de her tim pevçûn çêdibûn. Haya me ji xwerêvebirinê tune bû. Me digot qey sedema ji ber pêvajoyê ye. Ji du rojan carekê ji Lalebeyê dengê çekan dihat. Dengê teqînan dihat. Di navberê de qedexeyên kurt jî çê dibû. Ji bûyerên ku li Lalebeyê dihat jiyîn gelek sivîl birîndar dibûn. Li Sûrê destpêkê Murat Gunduz jiyana xwe ji dest da. Tevî pevçûnan jî kesekî malên xwe terk nekir. Jinên ku li kuçeyan bûn piştgirî didan ciwanan. Li kuçeyê bi hev re xwarin dixwarin. Jiyanek hevpar hebû."

**Ciwan li dijî zilmê serî rakir**

Tosûn da zanîn ku kesên 'hendek kolandin' ciwanên Sûrê bûne û diyar kir ku Sûr qêrîna ciwanan a li dijî neheqiyan bû û wiha pê de çû: "Komkujî, zilm, zext û êrîşên li ser gelê kurd bûbû sedema serhildana ciwanên Sûrê. Her wiha ciwanan ji bo tiştek bi gelê Sûrê neyê li dijî hemû êrîşan diparastin."

**Çîroka birîn û serhildanê**

Her wiha Tosûn ku serhildana li Sûrê şiband Keleha Dimdimê wiha dawî bi axaftina xwe anî: "Ciwanên Sûrê yên ku canê xwe feda kirin û kuçeya xwe terk nekirin dîrok nivîsandin. Sûr Keleha Dimdimê bû û neket. Her çiqas sal bibore jî dê hemû kes behsa Sûrê bikin. Dê Sûr ji bo me hem wekî birînekê hem jî wekî çîroka serlhildanê bimîne." *AMED*




## Yekane çareserî yekitî ye

Li Kerkûkê 2'yemîn Konferansa Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê ya herêma Kerkûkê bi beşdarbûna 120 delegeyan bi dirûşma 'Kerkûkê biryara bi hev re jiyan û xwerêveberiya demokratîk daye' pêk hat.

Di konferansê de hevseroka Tevgera Azadî Şîlan Şakir axivî û ev tişt anî ziman: "Bi giştî gelê kurd di rewşeke hestiyar de ye. Ev jî ji bo me zelal e ku komployeke navneteweyî li ser gelê kurd heye. Ev komplo jî Tirkiye pêşengiya wê dike. Ev çend roj in pêngava girtina baregehên me dest pê kiriye. Ev yek gihîşt wê yekê ku Tirkiyeyê spasiya girtina baregehên me kirin.Tirkiye dixwaze bi alîkariya hêzên navxweyî tevgereke azadîxwaz lewaz bike."

Şakir bal kişand li ser rewşa Kerkûkê û ev tişt vegot: "Desthilata nijadî bi hişmendiya neteweperestî rewşa Kerkûkê gihand vê rewşê. Divê projeya çareseriya neteweyî li Kerkûkê pêk were. Yekane çareseriya rewşa niha ya Kurdistanê lidaxistina Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ye. Divê gelê şoreşger û aliyên kurd bersiva komployên navneteweyî bi lidarxistina kongreya neteweyî bidin." *KERKÛK*



## HSD`ê li Dêrazorê bi sedan sivîl rizgar kirin

Operasyonên şervanên HSD`ê ji bo rizgarkirina sivîlên li Dêrazorê dewam dike. Di vê çarçoveyê de çavkaniyekî leşkerî ragihand ku şervanên HSD`ê bi sedan sivîl ji herêmên Sûse û Baxoz rizgar kirine. Heman çavkanî ragihand ku hin sivîlên ku hewl dan ji çeteyên DAIŞ`ê birevin û xwe bighînin herêmên rizgarkirî yên HSD`ê, çeteyan ew kuştin. Di hema demê de hin sivîlên din jî ji ber teqîna mayînên çeteyên DAIŞ`ê li herêmê jiyana xwe ji dest da. Çavkanî teqez kir ku herikîna sivîlan ber bi herêmên rizgarkirî ve dewam dike û şervanên HSD`ê wan digihînin herêmên bi ewle. *DÊRAZOR*



## Li Iraqê hêzên Heşdî Şebî rastî êrîşê hatin

**BEXDA -** Li gorî çapemeniya Iraqê duh danê sibê hêzên Heşdî Şebî yên li devera Yesrib ya bi ser parêzgeha Selahedîn rastî êrîşa çekdarî hatin. Hat diyarkirin ku di êrîşê de çekdarekî Heşdî Şebî hatiye kuştin û du jî birîndar bûne. Beriya niha bi hefteyekê jî hêzên Heşdî Şebî rastî êrîşeke çekdarî hatibûn. Ev êrîş û teqandina teqemeniyên ku bi wesayîtên hêzên Iraq û Heşdî Şebî ve dide xuyakirin ku dewleta Iraqê li dijî DAIŞ û çeteyên terorîst serkeftineke misoger bi dest nexistiye.

# Kurdan şer kir û xak azad kir

Nûnerê taybet ê Amerîkayê James Jeffrey diyar kir ku bi kurdan re pêwendiyên wan 'taktîkî û demkî ne'. Endamê kongreya Amerîkayê Gerald Connolly jî bertek nîşanî Jeffrey da û da zanîn ku kurdan şer kir û xak jî azad kir

**NAVENDA NÛÇEYAN**

Çeteyên DAIŞ'ê yên ku li serê hemû cîhanê bûn bela, bi têkoşîn û berxwedana keç û xortên kurd hatin têkbirin. Hemû cîhan bi dilbijandineke mezin berê xwe da berxwedana şervanên kurd. Ev berxwedana kurdan mirov dikare wekî berxwedana sedsalê bi nav bike.

Kurdan ew çeteyên ku hemû hêzên herêmî û hegemon lê mabûn yek bi yek têk birin, gel û xaka xwe azad kirin.

Li ser berxwedana kurdan hin hêzên hegomon jî dixwazin polîtîkayên xwe li xaka Sûriyeyê têxin meriyetê û bi tifaqa ku dikin jî wek taktîkî bi nav dikin. Lê tiştekî ku ji bîr dikin heye, ew jî li Sûriye, Iraq û Rojhilata Navîn bêyî kurdan tu çareserî û polîtîkayeke mayînde ne pêkan e.

Nûnerê taybet yê Amerîkayê James Jeffrey ku bi karûbarên Sûriyeyê re eleqedar e li civîneke Kongreya Amerîkayê li ser rewşa Sûriyeyê hem agahî da endaman û hem jî pirsên wan bersivandin. Li ser pirsa endamekî Kongreyê Gerald Connolly a li ser rol û çarenivîsa kurdên Sûriyeyê û pêwendiyên Amerîka bi wan re, James Jeffrey ev bersiv da: "Ev pêwendî taktîkî û demkî ne. Armanca ji vê yekê jî şikandina DAIŞ'ê ye…"



Bê guman ev ne bersivek û nêzîkatiyeke exlaqî ye. Ev bersiva James Jeffrey bi dilê wî endamê Kongreyê Gerald Connolly ku pirs arasteyî Jeffrey kiribû, nebû. Connlolly sekin û bertekeke di cih de nîşan dide û ev tişt ji Jeffery re dibêje: "Bêalîbûn di siyasetê de tiştek e û piştevaniya li dost û hevpeymanên ku xwîna xwe ji bo te rijandine, tiştekî din e. Kurdan şer kir û xak jî azad kir." Belê ya rast ev e. Lê belê rastiyeke din jî heye ew jî kurd ne kurdên berên ne û ji hemî dek û dolabên hêzên hegemon agahdar in. Kurd dizanin ku bi kê re û ji bo çi şer dikin. Di heman demê de şervan û gelê kurd dizanin ji bo çi şer dikin. Bêguman di şerekî ku tenê ji bo berjewendî û azadiya gelan de di windakirin tune ye.

## Serokê Amerîkayê yê berê George Bush mir



**Serokê Amerîkayê yê berê George Bush ê duh di temenê 94 saliyê de mir. Berdevkê malbatê, nûçeya koça dawî ya serokê Amerîkayê yê berê George Bush ragihand.**

**George Bush di sala 1924'an li wîlayeta Massachusettsê ji dayik bû û ji sala 1989'an heta sala 1993'an serdemekê serokê Amerîkayê bû. George Bush endamekî Partiya Komargeran a Amerîkayê bû, karê siyasî û leşkerî kir, endamê Kongreya Amerîkayê bû, balyoz û Rêvebiriya istixbaratê jî kiribû. Bush di sala 1990'î de û piştî dagirkirina Kuwêtê ji aliyê Sedam Huseyîn ve, George Bush pêşngiya hêzên Hevpeymaniya Navdewletî kir û artêşa Iraqê ji Kuwêtê derxist.** *WASHINGTON*

## Bi malperan nûçeyên derew belav dikin

Tê payîn ku dewleta Îranê bi rêya dehan malper û çavkaniyan, li gelek welatan nûçeyên derew û propagandayên xwe belav dike.

Ajansa Reutersê bi nûçeyekê dest nîşan dike ku pisporên înternetê deşîfre kirine ku dewleta Îranê bi rêya 71 malper û çavkaniyan, li 15 welatên biyanî nûçeyên derew belav dike û propagandaya xwe dike. Di raporta Reutersê de hatiye gotin ku navendên piraniya wan malper û çavkaniyan li nav Îranê de ne û armanca wan jî ew e rûyê rast ê Îranê veşêrin.

Yek ji wan malperan, malpera bi navê "Nilnet Online" e ku tenê ji bo gelê Misrê hatiye avakirin û nûçeyên derew belav dike. Siyaseta wê malperê jî ne li gorî siyaseta fermî ya hikûmeta Qahîrê ye. Tê gotin ku ew hejmarên telefon û navnîşanên ku li ser wan malperan hatine danîn jî yên derewîn in. Tevahiya van malper û çavkaniyan girêdayî dezgeha "Yekitiya Navdewletî ya Medyaya Sîber" e ku navenda wê li Tehranê ye. *AMED*




## Li Parîsê alozî



Îro li paytexta Fransa Parîsê ji ber xwepêşandanên li dijî bihabûna sotemeniyê û bilindbûna bihaya pêdiviyên jiyanî alozî derket. Rayedaran jî bi hezaran endamên hêzên ewlehiyê li hemberî van xwepêşandanan amade kirin.

Rayedarên Fransayê bi hezaran endamên hêzên ewlehiyê li Parîsê beriya xwepêşandana nerazîbûna bilinbûna bihabûna sotemeniyê îro hat lidarxistin. Rayedarên ewlehiyê hişyariya çalakiyên tundiyê da.

Xwepêşandêrên "Qutik zer" ev nêzî du hefte ne rêyan girtine û nerazîbûna xwe li hemberî bilindkirina bihaya sotemeniyê nîşan didin. Ev xwepêşandan li hemberî serok Emanuel Makron dijberiyeke mezin e. Li gorî dîmenên hatine belavkirin, hêzên ewlehiyê li kolana Şanzelîzê bombeyên gazê avêtin xwepêşandêran.

Xwepêşandêran ev nêzî du hefte ne rê girtine û tekeran dişewitînin û dirûşmên banga jikaravêtina Emanuel Makron dikin. *PARÎS*

## Washingotin 'Xeta Astanayê' wek rêyeke xitimandî dibîne

Rojnameya Erebî ya Şerq El Ewsat îro mijara astanayê xist rojeva xwe. Der barê danûstandinên Astanayê de bi mijara aloziya Sûriyeyê, rojnameya Şerq El Ewsat wiha got: "Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) got xeta Astanayê ya ku Rûsya, Îran û Tirkiyeyê der barê hûnandina destûreke nû ji bo Sûriyeyê de bi rê ve dibin, wekî rêyeke xitimî bi nav kir û teqez kir ku pêwîst e beriya dawiya salê encam were girtin."

Her wiha rojnameyê wiha got: "Nûnerê Neteweyên Yekbûyî yê Taybet ê Sûriyeyê Staffan De Mistura der barê bêencambûna Danûstandinên Astanayê û negihîştina çareseriyeke siyasî ji bo Sûriyeyê, nerazîbûna xwe anî ziman.

Wezareta Karên Derve ya DYA'yê jî bi daxuyaniyekê heman helwest nîşan da. Berdevka wezaretê Haydth Nawrt wiha got: "Di nava deh mehan de înîsiyatîfa Astana-Soçiyê xitimî." Der barê avakirina komîteya destûrî ya Sûriyeyê de jî diyar kir ku avakirina komîteya destûrî li Cenevreyê beriya dawiya salê mijareke çalak e ji bo sivikkirina fikran û peydakirina çareseriyeke siyasî ji aloziyê re." *ŞAM*

## 'Îranê tîmên terorê şandine Iraqê!'



Rojnameya Brîtanî ya Daily Telegraph di nûçeyeke xwe de radigihîne ku rejîma Îranê çend tîmên teror û tirsandinê şandine Iraqê ji bo serkutkirin û bêdengkirina ew kesên ku neyartiya Îranê dikin.

Li gorî agahiyên rojnameya Daily Telegraph a brîtanî, ew tîmên terorê bi fermana fermandarê hêza Qudsê ya pasdarên Îranê Qasim Suleymanî û piştî hilbijartinên parlamentoya Iraqê derbasî Iraqê bûne. Daily Telegrapgh destnîşan dike ku siyasetmedarê iraqî Şewqî Hedad ku kesekî nêzîkî Muqteda Sedir bû û li dijî hêza Îranê ya li Iraqê bû û Adil Şakir Temîmî ku kesekî nêzîkî serokwezîrê berê yê Iraqê Heyder Ebadî bû jî aliyê wan tîman ve hatin qetilkirin. Van tîman xwestiye meha tebaxê, Razî Tanî jî bikujin lê nekarîne. Razî Tanî kesekî nêzîkî mezinê şiayên Iraqê Elî Sistanî ye. Ew jî li dijî hêza Îranê ya li Iraqê ye. *AMED*



## Li Hudeydayê şerekî dijwar

Di şerê li bajarê Hudeyda yê rojavayê Yemenê de, 8 endamên hêzên hûsî û 2 endamên hêzên Yemenê di 24 seatên dawîn de hatin kuştin. Li bajarê Hudeydayê di navbera hêzên hûsî û artêşa Yemenê de ku Koalîsyona Erebî piştgiriyê didê, şerekî mezin rû da. Şer li eniyên rojhilat û başûrê bajar ên bi ser deryaya Sor ve zêde bû.

Çavkaniyên tenduristiyê di hundirê Hudeydayê de ji AFP'ê re diyar kir ku cenazeyên 8 endamên hêzên hûsî gihîştin nexweşxaneyên bajêr, her wiha 2 endamên hêzên Yemenê jî hatin kuştin.

Hêzên hûsî Nexweşxaneya Dar El Selam a nexweşiyên psîkolojîk li bajêr kontrol kir û xist navendeke leşkerî, her wiha bi dehan kadroyên tenduristiyê û endamekî rêvebeseriyê di nav de, 12 kesên ji nasnameyên cuda girtin.

Çavkaniyên Skynewsê got ku hêzên hûsî 42 nexweş birin cihekî nenas û cebilxaneyên xwe xistin hin embarên nexweşxaneyê. *SANA*

## Li Baltikê xeta ku dê gaza Rûsyayê bide sekinandin

Bi hewldana welatên ewropî ku dixwazin ji enerjiya Rûsyayê veqetin, Norweçê ji bo ku gaza xwezayî di ser Behra Balktikê re veguhêzin Polonyayê bi Danîmarkayê re peyman îmze kir. Lihevkirina di navbera Polonya û Damîmarkayê de ji aliyê hikûmeta Polonyayê ve hate ragihandin. Li gorî lihevkirinê dê Norweç ji bo gaza xwezayî xetên lûleyan yên ku di ser Danîmarka û Behra Baltik re veguhêze Polonyayê ava bike.

Di çarçoveya projeya 'Baltîc Pîpe' ku bi salan e di rojevê de ye dê di binê Behra Baltikê de 900 kîlometre xet were avakirin. Polonya dê ji sala 2022'an ku lihevkirina bi şîrketa Gazzprom a enerjiyê ya Rûsyayê re bi dawî bibe, dê gaza xwezayî ya Norweçê bi rêya vê xetê veguhêze Polonyayê.

Li Polonyayê dê xet ji aliyê Gaz System SA û ji Danîmarkayê Energînest SOV were avakirin û salê ji vê xetê dê 10 milyar metrekup gaz were veguhastin.

Maliyeta projeyê tam nehate aşkerakirin lê hate ragihandin ku ji aliyê Yekitiya Ewropayê ve ji bo Connectîng Europe Facility (CEF) fona 51, 4 milyona euro hatiye veguhastin. Serokê Polonya Mateusz Morawiecki têkildarî lihevkirinê daxuyanî da û diyar kir ku ji bo bidawîbûna enerjiya rûs pêngaveke girîng avêtine û bo enerjiya Polonyayê pêngavek mezin e. *BRUKSEL*



## Grosseto de Roşanê Ganebîyayîşî ame pîrozkerdene

**GROSETTO -** Bajarê Grosseto yê Îtalya de Kurdistanijan û dostanê înan serragêrayîşê ronayîşê 40. yê PKKyî bi coşa girde pîroz kerd. Şewe de mesajê Hemserekê Konseya Rayberdişî yê KCKyî Cemîl Bayikî yê derheqê ronayîşê PKKyî bi rayîrê sînevîzyonî ameyî seyrkerdene. Bado zî sîyasetmedaranê kurdan ra Ozan Bagokî derheqê muhîmîya PKKyî de qisey kerd. Hozan Comert û Hozan Sehere zî bi kilamanê xo yê şorişgêran tewrê şewe bîyî. Şewe bi sloganê 'Bijî Serok Apo' yî qedîyaye.



# 'Tecrîdî sînorê Îmraliyî vîyartî'

### Hemsereka ÎHDyî Eren Keskîne bale ante tecrîdo ke Îmraliyî de bi hawayêkê sîstematîkî 19 serrî yê dewam keno û grevê vêşanîye yê Leyla Guvene ke seba wedartişê tecrîdî dabi destpêkerdene ser o û ard ziwan ke tecrîdî sînorê Îmraliyî vîyartî

Tecrîdo giran ke Rayberê Şarê Kurd Abdullah Ocalanî ser de yeno bicaardiş, dewam keno. Nizdîyê 19 serrî yo ke Rayberê Şarê Kurd Abdullah Ocalanî ser de tecrîdêk yeno bicaardiş û no tecrîd bitaybetî çend serranê peyênan de ameyo girankerdiş û Ocalan yeno îzolekerdiş. Tewr peynî 11ê êlula 2016î de Mehmet Ocalanî birayê xo reyde pêvînayîşêko kilm viraştbî û aye tarîx ra nata ti xebere Ocalanî ra nîna girewtene. Hemsera Komeleya Heqê Merdiman (ÎHD) Eren Keskîne derheqê tecrîdê serê Ocalanî û grevê vêşanîye ya Leyla Guvene de qisey kerde.

Eren Keskîne destpêkê qiseykerdişê xo de va 'Zîndanê Îmrali de roja ewilêne ra tecrîdo girankerde yeno bicaardene û prosesê aşitî de qe nêbo tecrîd amebi şenikkerdene' û wina domnaye: "La nika tecrîdî sînorê Îmraliyî vîyartî. Qerar ke gîrîyayê sîyasî yê. Tirkîye bi tecrîdê serê Ocalanî heme qanûnî girewtê binê payan. Bi nê hawayî Tirkîye wazena ke îşkence meşrû ramojno. Ma sey pawitoxê heqanê merdiman nê îşkenceyî bi tu hawayêk qebûl nêkenê."



**Qerarê MHME huqûqî nê sîyasî yo**

Keskîne hemverê redkerdişê muracatê seba wedartişê îşkenceyî yê serê Ocalanî de ke Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) rê kerdibi de zî reaksîyon ramot û va: "Gama huqûq de qerarêk gîrîyeno nasnameyê şexsî ra nêno ewnayene. Çîyo muhîm estbîyayîş yan zî çinbîyayîşê îxlalê heqî yo. La çi heyf ke sey Tirkîye welatê Ewropa zî qeraranê sîyasîyan gênê. Qerarê MHME zî huqûqî nê sîyasî yo. Eke MHME tenya tecrîdî zî bigirewtêne îtîbar ganî qerarê redî nêdayêne."

**Ma xeylî merdiman kerdî vindî**

Keskîne derheqê grevê vêşanîye yê Leyla Guvene ke seba wedartişê tecrîdî dabi destpêkerdene û kewto roja xo ya 25. zî nînan va: "Ma sey ÎHD hemverê grevanê vêşanîyan ê bêdembêagêrayîşan ê, la xeylî wextan tepişteyî seba ke biresê heqanê xo çalakîyanê bi nê tewiran virazenê. Waştişê Guvene waştişê qanûnî yê. Ma do sey pawitoxê heqanê merdiman paştî bidê Guvene. Ganî organîzasyonê demokratîkî zî bêveng memanê û paştî bidê Guvene. Ma heta nika xeylî kesî vîndî kerdî la ma nêwazenê Leyla Guvene vîndî bikerê."

**Guvene: Meyero serdana mi**

Keskîne qiseykerdişê xo yê peyênan de qala serdana Leyla Guvene kerde û wina qedênaye: "Gama ke ez şîya serdana Guvene û mi aye rê persa ke çira çalakîyêka winasî daya destpêkerdene. Aye nê çîyan va; 'Serê Ocalanî de tecrîdo girankerdene yeno bicaardene, seba peynîbiciardişê tecrîdî mi na çalakî daye destpêkerdene. Verî demeyêk cigêrayîş û dîyalogê seba aşitî virazîyayî, nika zî eşkenê bêrê viraştene. Ez seba xo nêkewta nê grevî, ez seba tecrîdo ke Îmralî ser o yo û zîndananê bînan ser o yo wedarîyo kewta nê grevî. Ez umîd kena ke çew seba peynîbiciardişê çalakîya xo meyero serdana mi. Heta çalakîya mi bireso amacê xo ez do çalakîya xo bidomnî.' Guvene nê çîyan va." ***AMED***

## Mulkîye Bîrtane ameye tewqîfkerdene



Endama Dîwanê Kongreya Komela Demokratîke (KCD) û parlementera verên ya Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Qersî Mulkîye Bîrtane ameye tewqîfkerdene. Mulkîye Bîrtane 26ê teşrîna peyêne de netîceyê sereştişê keyeyan yê Amedî de ameyebî tepiştene.

Perê Qers de doza endama Dîwanê KCDyî û parlementera verên a HDPyî ya Qersî Mulkîye Bîrtane ameye viraştene. Fealîyetê KCDyî hetê mehkema ra sey suc ameyî hesibnayene û Bîrtane bi îddîaya 'endamîya rêxistinî' ameye tewqîfkerdene.

Heto bîn ra çarçiweya operasyonanê qirkerdişê sîyasîyan de Mêrdîn de 6 û Tarsûs de zî 8 kesî ameyî tewqîfkerdene. ***QERS***

## Ma do timî têkoşîn bikerî

Edene de mîyanê 5 aşmanê peyênan de 5ê ci doman 81 kesî ameyî tepiştiş û 6 kesî parekerdişê xo yê medyaya sosyalî û beyanê şahidan vera bi îdîaya 'propagandaya rêxistine' û 'endamîya rêxistine' ameyî tewqîfkerdene. Endamê Meclîsê Ciwanan yê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Edene dîyar kerdî ke ê do hemverê operasyonanê tepiştiş, tewqîfkerdiş û ferzkerdişê sîxurî de têkoşîn bikerî.

Derheqê babete de endaman ra Bayram Ektîren, Seyît Muhammed Bariş, Mehmet Kaplan û Ferhat Sezgînî qisey kerdî û bale antî operasyonê sîyasîyan ser o.




**Ma raşteyê legal de xebetîyenî**

Ciwanî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Her çiqas ke tepiştiş, tewqîfkerdiş, operasyon û ferzkerdişê sîxurî ciwanan ser de bibob zî ciwanî timî xo ver danî. Têkoşînê 40 serran esto û ciwanî do têkoşînê xo dewam bikerî. Ciwan eşkenî qoltixê înan bilerznî. HDP partîyêko legal o. Ma zî raşteyê legal de xebetîyenî. Hedefê ma azadîye û demokrasîye yo. Ma hemverê binpaykerdiş û pelçiqnayîşan de çong nêronenî." ***EDENE***

## Firindarî zî KRÎZ vera nêeşkenî debara xo bikerî



Aşma êlule de Federasyonê Firinê Tirkîye aşkera kerd ke do se ra 15 nan bêro vayekerdene. Badê no îzehetî xeylê bajaran de nan ame vayekerdene. Labelê Wezîrîya Bazirganî zî îzehet daye û dîyar kerde ke ganî nan nêro vayekerdene û vayeyê ke ameyî kerdene tepîya ameyî antene. Mêrsîn de zî Odeya Firinan 25 quruş nan vaye kerdbi, labelê badê îzehetê wezîrîye vaye teqîya ante û nan reyna kerde yew lîre. Firindarê bajarî ardî ziwan ke krîzê ekonomî şîyayeyê înan se ra se zêde kerdo û ê nêeşkenî çerxa xo biçarnî.

Firindaran ra Îbrahîm Demîro ke 23 serrî yo firine de xebetîyeno û Haci Sekmano ke 40 serrî yo xebetîyeno derheqê krîzê ekonomî de qisey kerdî. Firindarî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Torbeya ardî bîya 150 lîre, labelê yew nan yew lîre yo. No krîzî de ganî nan bibayêne 2 lîre. Yew lîre zaf tay o. Ma vindetişê Odeya Firinan ya Mêrsînî rexne kenî. Ganî Ode hemwelatîyan ra vaja ke seba çi nan hende vaye kerda." ***MÊRSÎN***

## Keso se ra 75 astengdaro rê ceza dayî

Fakulteya Tibi ya Unîversîteya Dîlokî û Nêweşxaneyê Perwerdeyî û Cigêrayîşî yê Ersîn Arslanî raporê 'se ra 75 astegdaro zihnî yo' dayî seba Yusuf Taşî. Labelê Dezgeyê Tibê Edlî (ATK) goş nêda raporî û sebat Taşî va 'Eşkeno zindan de bimano.' Badê raporê ATKyî 3. Mehkemaya Cezaya Giran ya Dîlokî bi îdîaya 'endamîya rêxistine' 12 serr û nêmî ceza daye Taşî.



Ceza 2ê çeleyê 2017î de ameye tesdîqkerdiş. Dima ra Avûkat Yakup Koca 9ê çeleyî de muracatê Mehkemeya Qanûno Bingeyî (AYM) kerd. Labelê AYM bi mehneya 'muracat wextê xo de nêameyo kerdiş' muracatê Kocayî red kerd. Koca dîyar kerd ke do dosyayê muwekkîlê xo ê ke serra 2014î de Zindanê Tîpa Hyî yê Dîlokî de mendo bierşawo Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) û AYM muwekkîlê mi reyna mexdur kerdo. ***DÎLOK***

## Kokimê Pisînga Wan çinbîyayîş ver de yo



Pisînga Wan ya ke bi taybetmendîyanê xo dinya de sey aye sewbîna tewir çin a bi mudaxaleya bêplankerde yê merdiman vera kokimê înan çinbîyayîş ver de ya. Pisînga Wan bi purtê xo yê sipî, çimanê xo yê zerd û keskan dinya de sewbîna tewiro ke manena aye çin a. Sewbîna taybetmendîya pisînge ra yew zî oyo ke vîşêrê Wanî sewbîna ti cayêk de nêeşkena bicuya. Hetta serra 2000î het raşteyê Wanî de ameyêne dîyayene, labelê nika zaf kêmî bîyî û tena cayê dîyarkerde de estî. Sebebê na zî mudaxaleya bêplankerde yê merdiman û êdî bîya sey darûya bazirganîye.

Zîlan Ergîn Oguza ke Keyeyê Pisîngan ya Wanî de xebetîyena wina va: "Tîya seba ke pisîngî bi hawayo xozayî bivirazîyî ameyo awankerdiş. Dima ra ma pisîngan vera danî teber. Emrê Pisînga Wan heta 12 û 17 serran şono. Pisînga Wan aw û merdiman ra zaf hes kenî û tena Wan de eşkenî bicuyî. Talebê herînayîşî zêdeyî, la ma nêroşenî. Çimkî kokimê înan çinbîyayîş ver de yo." ***WAN***

www.arsivakurdi.org

## Kovara jinan: 'Jujin'

Sîbel OZALP / STENBOL - JINNEWS

Navê Jujin, ji navên 'jujî û jin'ê pêk tê. Jinan bi armanca ku jin bi diriyên xwe li hember êrîşan parastina xwe bikin, navê Jujin bi kar anîye û di 2'ê kanûna 1996'an de Jujin derxistin. Jinên ku di pêvajoya ku kuştinên kiryar pêk dihatin de, xwe berpirs dîtin. Di encama nîqaşên wan de kovar derxistin û ev wek berdewamiya kovara beriya wê 'Roza' bû.

Jinan li dijî her cureyê êrîşan, xwest wek alava parastinê diriyên wan hebin û xwestin van jî li dijî nêrîna serdest a mêr û pêşdarazên mêr bi kar bînin. Yanî jinan bêyî ku bêjin 'mêr çi difikirin' îlana nîşandana diriyên xwe kirin.

Ji ekîba Jujin bi nasnavê Hande di roportajek xwe de diyar dike ku xeta Jujinê bi ya Rozayê re heman e û wiha digot: "Jinên kurd kêm dinivîsî. Derfetên nivîsandinê tunebûn. Me binivîsiya jî me bi navê kod dinivîsî. Bi veşarî. Me dixwest em pirsgirêkên xwe di rayagiştî de bidin xuyakirin. Me dixwest em di qada nivîsandinê de xwe bi pêş bixin."

**'Serbixwe û li ser jinê bû'**

Di 1996'an de bi piştgiriya jinên li Ewropayê li Amedê Jujin nêzî 500 hezar dihat firotin. Jinên Amedê, xetereyên wê demê piştguh dikirin û bi îmzeyên veşarî bin jî nivîs dişandin kovarê û hewl didan bi piştgiriya xwe Jujinê li ser pêyan bigirin. Ekîba Jujinê hewl dida piştgirî bide têkoşîna jinên kurd û di navbera jinên kurd de têkiliya hestî ava bike.

Jinên di kovarê de dinivîsin, diyar kir ku wan pêla femînîstiyê jî di weşanên xwe de bi cih kirine û wiha gotin: "Me bi van kovaran tirsa xwe derbas kir. Me pirsgirêkên xwe dan xuyakirin. Bixwebaweriya me zêde bû."

Kovar heta sala 2000'î weşana wê hat kirin û cih da nivîsên kurdî jî.



# Piraniya xwînerên Kundê jin in

Kovara Kundê bi hejmara xwe ya nû gihîşt ber destê xwendevanan. Endama Lijneya Weşanê ya Kovara Kund Ronya Bewran anî ziman ku piraniya xwînerên Kundê jin in û ew dixwazan hejmara xwînerên jin zêdetir bikin



Hejmara 3'emîn a Kovara Pirtûk, Çand û Hunerê ya Kurdî 'Kund' li gel ku heta niha tenê 3 hejmarên wê hatine weşandin jî xwedî girseyek girîng a xwîneran e. Di hejmarên xwe yên yekemîn û duyemîn de cihekî girîng daye nivîskarên jin, wêjevan û lêkolîneran.

Kovar di vê hejmara xwe ya 3'emîn de jî bi mijarên xwe yên giranbiha û bi dosyaya xwe ya taybet ku li ser berhemên şêwekar, aktor, lêkolîner, aktîvîst, romannûs, helbestvan û mamoste Ferhat Pîrbal li benda xwendinên xwe ye. Der barê kovara Kundê de endama Lijneya Weşanê ya Kundê Ronya Bewran axivî.

**'Kovar bi formata nû ye'**

Bewran bi lêv kir ku kovara Kund bi formata xwe ji bo kovargeriya kurdî nû ye û da zanîn ku di kovargeriya cîhanê de gelek mînakên bi vî rengî hene ku ji wan re dibêjin nifşên nû û wiha behsa zehmetiyên kovarê kir: "Zehmetiya pêşî em dikişînin. Em bi xwe jî di vê cureya kovargeriyê de nû ne û hewl didin xwe bi pêş bixin û vî karî baştir bikin. Zehmetiya duyem û ya herî mezin lawaziyeke civata kurdî ya ehlê xwendin û nivîsînê ye. Ev lawaziya di warê dîtbarî de ye. Zû bi zû kes peyda nabe ku îlustrasyoneke, xêzkirineke baş çêbike. Zehmetiya sêyem jî di warê aborî de ye. Ev kovarên bi vî awayî, ji ber rengînbûna xwe û ji ber ebata xwe, bi bihayekî zêde tên çapkirin. Ji ber vê dema ku em diweşînin em fikara firotinê jî dikin. Ez wiha bibêjim; wekî mînak hejmara sêyem, ji bo ku temamê mesrafa xwe derxe divê hemû bên firotin."





Bewran di berdewamiya axaftina xwe de got ku di kovara Kund de cihê jinê cihekî gelek girîng e û wiha pêl da axaftina xwe: "Em di Kund ji bo jinan teşwîqkirina erênî dikin, em pêşberiyê didin wan û hewl didin. Em dixwazin ku nivîsên jinan tê de pir bin. Em nivîsan ji wan dixwazin û ji bo nivîsên wan hewl didin. Di her sê hejmarên Kund de 22 nivîsên jinan hene. Ev ji bo xwendewariya kurdî îstatîstîkeke gelekî baş e. Hin jinan cara ewil di Kund de nivîsîn û berdewam dikin. Mala wan ava be, miqabilî vê yekê, em dibînin ku piraniya xwînerên Kund jin in. Axirê cihê jinan di Kund de baş e, xweş e, lê em dixwazin baştir, xweştir û zêdetir bibe. Weke îstatîstîk, di hejmara yekem de 4, di ya duyem de 11, di ya sêyem de 7 nivîsên jinan hene."

Bewran di dirêjiya axaftina xwe de behsa hejmara yekem û hejmara sêyem kir û ev tişt got: "Her du hejmarên ewil, rastî eleqeyeke gelekî mezin hatin. Çapa hejmara yekem qediyaye ji xwe, ya duyem jî pir hindik maye. Hejmara sêyem jî baş diçe, lê belê ne bi beza herduyên ewil e, tevî ku hejmara herî bihêz ev e jî. Lê belê divê em neheqiyê li xwîneran nekin. Em dikarin bibêjin ku girseyeke xwînerên Kund çêbûye. Gelek xwendevan li benda weşana wê dimînin. Ji ber ku çawa tê çapkirin di serî de gelek baş tê firotin. Ev ji bo me cihê kêfxweşiyê ye."

**Bi hêvî li kovarê dinihêrin**

Bewran da zanîn ku ew bi geşbînî û hêvî li kovarê dinihêrin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Hêvî dikim Kund xwedî temenekî dirêj be. Vê jî bibêjim ev jî ji hêlekê ve di destê xwîneran de ye. Gotina min ji bo xwîneran ew e ku em spasiya xwîneran dikin. Di vê hejmarê de jî wan em tenê nehiştin û xweşxwaziya xwe ji me kêm nekirin. Mala wan ava be. Ez wek tekane jina lijneya di weşanê de, gazî jinan dikim; bi wêrekî, binivîsin û biweşînin." *MÊRDÎN*

# Medreseya Sor hildiweşe!





Li navçeya Cizîra Şirnexê, Medreseya Sor a dîrokî ya tirba tesawûf û şaîrê kurd ê bi nav û deng Melayê Cizîrî jî li wir e, ji ber barana zêde xesarê dibîne reseniya xwe winda dike û hildiweşe.

Serokatiya Îdarî ya Başbûna Herêmê GAP'ê di çarçoveya "Projeya Bawerî ya Cizîrê" de di navbera salên 2006 û 2007'an de bi mîlyonan TL ji bo restorekirina medreseyê xerc kirin. Lê niha ji bo medreseya ku hemû aliyên wê rutûbet girtiye tiştek nayê kirin.

Hemû malzemeyên di dema restorekirina medreseyê de hatin bikaranîn, ji ber ku ne baş bûn, niha hemû hildiweşin. Ji ber barana zêde jî, dîwar û serbanê wê zirar dibînin û xerab dibin. Dîsa ava di ber diwarên medreseyê re dikeve hundir û gelek aliyên medreseyê bûne rutûbet. Di haman demê dîwarên rengê wê hatine guhertin, her roja diçe reseniya xwe winda dike.

Medreseya Sor di serdema sedsala 15'emîn de, di dema Mîrtiya Cizîrê de hatiye avakirin û xwedî hewşek mezin e. Di nava medreseyê de hin dersxane, xwaringeh, avahiyên mamoste û feqeyan hene. Ji ber ku bi blokên sor hatiye avakirin, weke Medreseya Sor tê binavkirin û tirba tesawûf û şaîrê kurd ê bi nav û deng Melayê Cizîrî jî li vir e. Medreseya Sor yek ji navendên girîng ê perwerdeyê bû û di dema Mîrtiya Şerefxan û Bedirxaniyan de jî, weke navenda ilm, çand û hunerê tim dihat bikaranîn. *ŞIRNEX*

# Li Helebê Pêşangeha Şopdarên Rojê

Pêşangeha Şopdarên Rojê ya wêneyan li taxa Şêxmeqsûd a Helebê hat vekirin.

Navenda Şopdarên Rojê wêneyên ku ji şervanên hêzên leşkerî yên li eniyên şer kişandine û zarokên herêmên bakurê Sûriyeyê û herêma Cizîrê pêşkêş dike. Piştî pêşandana wêneyan li Cizîr û herêma Firatê navendê pêşangeha xwe îro li hola civînan a taxa Şêxmeqsûdê ya Helebê vekir.

Bi dehan welatiyên taxê berê xwe dan pêşangehê û li pêşangehê geriyan. Di pêşangehê de bêhtirî 100 wêne hatine pêşandan û rastiya berxwedan û têkoşîna welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyeyê aliyên leşkerî, civakî û çandî vedibêje. Di pêşangehê de beşeke taybet ji bo wêneyên Berxwedana Serdemê ya Efrînê û Reqqayê hate veqetandin.

Di nava çalakiyên pêşangehê de sînavîzyonek der barê Berxwedana Serdemê ya Efrînê û berxwedana Şêxmeqsûdê de hate pêşandan û tê de hovîtiya artêşa tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li dijî welatiyên Efrînê û taxa Şêxmeqsûdê û qehremantiya şervanan a li hemberî êrîşan vedibêje. Çalakiyên pêşengehan di 27'ê îlonê de dest pê kir û li gelek deverên herêmê Cizîr û Firatê hatin pêşandan. *HELEB*





# Şanoya 'Tenê Ez' hat pêşandan

Lîstika şanoya "Dîktatorê Mezin" a fîlma komedî ya derhêner Charlie Chaplin ya bi kurdî "Tenê Ez" hat pêşandina. Lîstik rastî eleqeyek mezin a şanohezan hat.

Lîstika şanoya "Dîktatorê Mezin" a fîlma komedî ya ji aliyê derhêner Charlie Chaplin ve di sala 1940'an de hat amadekirin a bi kurdî "Tenê Ez" ji bo şanohezan hat pêşandan. Şanoya ji aliyê lîstikvanên Teatra Jiyana Nû ve hat amadekirin, saetek û 20 deqeyan berdewam dike. Şano li ser Dika Mezopotamyê ya Beyogluyê hat nîşandan. Lîstik rastî eleqeyek mezin a şanohezan hat. *STENBOL*

www.arsivakurdi.org